

# Welat

Hejmar «2» Rewşenbîrî Giştî-  
5 Pûşper 2013

Çandî - Giştî- serbixwe

Lihevborandin  
taybetmendiya sereke di her  
civakeke pêşketî û sivil de ye, gelê  
ku lihevborandin di nav xelkên  
wê de hebe , gelekî dikare hemî  
astengiyên di hemî milan de ji  
pêşiya xwe rake û dikare dewleteke  
xurt û hevgirtî ava bike Jo bo  
xwespanandin û zeftkirina desthilatê  
û têkbirina hêminiyê û aramiyê li  
welatan , rêjîmên totalîter herdem  
hewla efrandina nakokiyên di nav  
pêkhatayên gelê xwe de dikarin û  
ew bi vê yekê garentiya jibîrkirina  
gelan ji sitemkariya li ser wan bi  
kar tîne, dike.

tiştêkî normal e ku belavbûna  
tundriyê û ekstrêmîzmê di nav  
civaka sivil de tûndûtîjiyê biafrîne  
Gelê sûrî di ti demê de ji bilî  
dema desthiladariya rêjîma Hafîz  
EL ESED û kurê wê Beşar ev şer,  
nakokî û alozî di nav pêkhatayên  
xwe de nedîtiye, lê gelê Sûrî  
gelekî hişmende û dikarîbû gelek  
astengiyên derbas bike ta ku  
şoreşa Sûrî ya xwedî ruhê biratiyê û  
hezkirinê di nav pêkhatayên vî gelî  
de rabû, ev şoreşa ku di hundirê  
wê de her parêzgehek ya din silav  
dikar û vê yekê bêtir ji her tiştî  
hêrsa rêjîmê efrand û hemî planên  
rêjîmê bo peydakirina fitneyê di  
nav vî gelî de şikand .

Mirov dikare bêje ku rêjîmê hemî  
hêzên xwe weku bo efrandina  
fitneyê di nav pêkhatayên gelê  
Sûriyê de terxankir , wisa di şerê  
dijî rikberiyê de terxan nekir.  
Lihevborandin di nav gelan de  
ji lihevborandinê di nav hakim û  
gelan de girîngtir e ji ber ne pêkane  
ku gel doza lihevborandinê bike û  
ew vî tiştî napejirîne

Aras yûsiv



welat.press@gmail.com

www.facebook.com/DengeKurdistanasurya



# HUNER Û ŞOREŞ

**D**i dema aştyê de, û bi hevkarîya huner, wêje, û zanistê, gelek guhertinên giring di civakê de çêdibin, lê mixabin carna ew civak gerekî şoreşekê dibe, ta ku wan xewn û xeyalên ku hunerê jê re nîgar kiriye bi cî bîne.

Huner derbîreke bi astakî bilinde, ku ji demsalên kevn ve, mirovan, ji bo ku wan hestên ku di derûna xwe de, ji derdora xwe re derxe, huner bi kar anî, ji ber wê yekê wek zimanekî jî tê nasîn. ango mirov bi riya hunerê kare tiştê di derûna xwe de wergerîne û bi ke awazek, peykerek, şanoyek, wêneyek,.....û,td.

gelek zanistan hunerê dibînin pêwîsteke jiyanê, wê dibînin mîna av û xwarinê, bê yî wê jiyan nabe, û ji hêleke din ve wek pîvanekê ji şêristanya miletan re dibînin. Ji ber vê, ne cihê matmayînê ye, ku şoreşa Sûriyan bi xêzikên zarokên



Der-a yê,destpêkir. dema xewnên xwe bi welatekî azad, li ser diwarên dibistana xwe raxistin, mixabin rijîm bi çavsorî ew bin çavkirin, ji ber tîrsa wa ji gotina AZADÎ yê, wek ku hunermendê şoreşger (Semîh Şiqêr) di strana xwe(YA HÊF) de da xuya kirin.

Wiha xuya bû ku huner ji destpêkê de bi şoreşê re bû, û rolek mezin di

piştgêriya wê de lîst, nemaze di qûnaxê tengasiya şoreşê de, bi stranên (Qaşûş) hêrza şoreşvana bilind dibû, û dîsa bi dengê bilind banga azadiyê dikirin, û ji rêjîmê koçkirin dixwestin, û hîn jî Ferzat, bi wêneyên xwe yên karîkatorî, cilikê ji ser veşartiyên rêjîmê radike, da ku stran û helbest û wêneyên karîkatorî, mil bi mil bi şoreşvanan re li dijî hêzên sitemkariyê rawestin. Lê rêjîmê jî sînore metirsya hunerê di zanî bû, ji ber vê yekê, û ji destpêka şoreşê ve, hunermend dabûn ber çavê xwe, û gelek ji wan xistin zindanan û dane ber îşkenceyan, û hîn ji wan bûne pakrewan û qurbanyên welatê xwe.

di helwestekê din de, rêjîm da xuyakirin, ku dijminatîya wî bi hunerê re, dijminatîyeke

kore, dema ku destê Ferezat şikand, zengelorka Qaşûş rakir, dixwest nameyekê tirsandinê, bighîne hunermendên din jî, da ku ji piştgiriya şoreşê vegerin, lê hunermend ji rêya şoreşê ve venegeryan, çimkî huner bi xwe rastiyeke şoreşî ye, xebata xwe ji bo pêşerojê rengîn û zengîn dike.


Hesen Berzencî

# Şoreş talankirin

Azadî.....azadî.....

peyva yekemîn likolanan  
hat bankirin piştî çil salî ji  
zordestî û bin çavkirinê  
Avdara 2011e mîna  
buhara 2004 an rûpeleke  
nû dipirtûka dîrokî ya sûrî  
nivîsand

Ciwanan dest hev girtin  
ruxandin dîwarê tirsê..!!!!!!  
bi hevre gotin yan mirin û  
yan azadî  
dan ber çavên xwe ...  
girtin...lêdan...û kuştin  
Bi aştî û bişaxên zeytûnê  
Xwestekên xwenî rewa dan  
xuynikirin  
Şoreşa rûmetê destpêkir..



Dîsa pût herifîn

.....

Bi vî rengî her î n xel li seranserê  
sûrî li ber mizgeftan komdibûn  
Her bajar bi rengê xwe dest  
bixwepêşindanê xwe dikirin û li her  
derê bandikirin( yeke yeke mîletê  
sûrî yeke)

Piştî berdwamiya şoeşê bi  
rengê xwenî aştîyane hin bi hin  
agirê şoreşê gurdibû û beşdariya  
calakvanan ji hemû olan bêtir dibû.

Rê li ber rêcimê firebû û pêre  
hejmara kuştinê pîrbû rêcim çekên  
giran berdan  
Kolanan û Bi balfiran mîlet gule  
barankirin  
Bi pişgirtina hin dewletên cihanî  
mîna rûsiya

Û kesên dendorî wê ..îraq ..eyran û  
gurûpa hesen nesrelaah  
pir destên qirêj xwe berdan nav  
sûrî ta ku berjewendiyên xwenî  
kesane bikarbînin.?????

kengî şoreş talanbû  
Dema şaxên zeytûnê hat guhertin  
bi tivingan  
Û derbasbûna şoreşê rola  
çekdariyê  
çaxa bazeganên xwînê xwe berdan  
nav mîlet  
wêrankirin civaka sivîl avakirin  
ramana çekdariyê  
Keda ciwana talanbû her kes bû  
dijber kesên be; sî û yên salox.  
Guhertin şoreşa rûmetê  
Bi erzanî firotin mirovatî

Jibîr kirin mîlet berîdan dolara  
Lê jibîrkirin ku ev şoreşa gelaye  
Bayê wê bi hesanî wê gemarê  
bihevde  
Wê şoreş berdwambe heta ku  
beyva  
Azadî .....azadî .... Li ser qadê  
bi cî bê  
Wekî yûsif berazî ( bêbuhar)got :  
Mêrê gemar îro hemî pêşketin  
Karê nebaş îro ji war paşketin  
Mêrê durust nabin xulam  
Ba tê gemar dajo li ser kom dibê  
Lê qet gemar avê ji çem nagirê  
Av xurt dibê dajo gemar pak dibê  
Efsanê Amûdê .....

Alan Alûcî

# ALFABEYA ME

Peyv : A.Gernas

B .. Berf û Baran, Ba û Bager, bi  
tîpa B dest pê dikin

C .. Cilik û Caw, Can û Canan, Car û  
Carna li hev dikin

Ç .. çî û Çima, Çend û Çawa, bi  
hostayî pirsan dikin

D .. Dar û Devî, Der û Dever, Dû û  
Dûxan dawet dikin

\*\*\*

F .. Fêkî ji dar, Firo ji sîr, Firçe ji mû  
çêdibe

G .. Guvîj û Gûz, Gûlik, Gêzer, Garis  
Genim xurekên me

X .. Xal û Xaltî, xwişk û Xwarzî, çend  
nav in ji malbata me

H .. Heft û Heftê, Heşt û Heştê,  
Hivdeh, Hijdeh hejmarên me

\*\*\*

J .. Jîr û zîrek, Jan û Jehrî, Jêr û  
Jorîn bi harmonî

Q .. Qam û bejin, Qal û bêla, xweş li  
hev tîn Qaz û Qumrî

K .. Kerrî, Korî, Kulek, Kotî tîn  
naskirin wek seqetî

L .. Lehî, Lorîn, Laleş, Leyla me  
wek nav li keçan danî

M .. Mezin nîn in Mes û Mûrî, biçûk

nîn in ga Mange

N .. Nû û Nûjen, nexş û Nîgar, Nav  
û paşnav hevmane ne

P .. Paqij û Pîs, Pêş û Paşî, Pîr û  
ciwan dijmane ne

R .. Rast û durist, Rê û Rêçik, Reng  
û Rûçik biwêjên me

S .. Serê Sibê, Sar û Seqem didim  
Ser rê bo ferbûnê

Ş .. Şêr heywan e, Şiv xwarin e,  
Şop rêçik e, Şil avî ye

T .. Ter Teze ye, Tev hemû ye,  
Tam lezet e, Tarî şev e

V.. Vir derew e, Vîn viyan e, Vejîn  
jîn e, Vizîn deng e

W.. War Welat e, Wax axîn e, Wêne  
resm e, Wek mîna ye

Y.. Yar heval e, Yal alî ye, Yarî  
henek, Yekşem roj e

Z .. Zarokên Kurd, Zaf Zana ne, hez  
dikin ji Zimanê xwe

A .. Azad dikin ew Axa xwe, bilind  
dikin ew Ala xwe

E .. Em Emîn in, Eger Em tev hez  
bikin ji welatê xwe

Ê .. Êl û esîr Êdî tev de, em dizanin  
bi Êsa xwe

I



Î .. îro tu xwe bixemlîne, îşev serê  
sala nû ye

O .. Ola Kurda ya kevnar e, Êzdîtî  
ye tu nas bike

U

Û

(Divê ev stran wek stranek  
jiberkirinê neyê pejirandin. Ev ji bo  
zarokên ku teze dest bi dibistanê  
kirene û fêrî alfabeyê dibin, strana  
alîkariyê ye. Divê beş bi bes, parçe  
bi parçe

Bête fêrkirin da ku bi riya  
muzîkê fêrkirina alfabeyê hêsantir  
bibe û hewesê çêbike.)

Jêder : Pirtûkeke Kurdî

## DIBISTAN

Peyv: A. Gernas

Sibehê zû radibim

Ser û çavê xwe dişom

Têr dixwim taştêya  
xwe

Li xwe dikim çekên xwe

Çentê xwe didim milan

Berê xwe didim dibistan

Bi rojbaş dest pê dike

Dersa Kurdî ser çavan

Dibistan çiqas xweş e

Mamoste tim rûgeş e

Fêr dibim gelek tiştan

Davêjim xem û derdan

Ez dikarim bixwînim

Bixwînim û binvîsim

Êdî ji tiştê natirsim

Bi dinyayê dihesim



# Bajarê Dirbêsiyê

Dirbêsi weke tê zanîn bajarekî ne pîrî kevnare, ji hêla avaniyê xwe de, jiber di dema desgêrê Firensa hatiye avakirin, nexasim sala -1931 1932 ku bazar û dezgehên fermî damezirîn, ew bi xwe di nav sînorê 3 gundan de bi cih bûye, di nav êl û eşîrên Kurdan de, yek: ji hêla rojhilat ve gundê Tilêlûnê (êla Kuseka), ji hêla başûr de Kerbetilî (Saroxana), û Xenamî (Azîza) û Tilkidîş ( Mala Ristêm û ew bi xwe Axê Kîkanin) û ji hêla roava Çetelê (Omera)..

û êlin din jî hene li hirême mîna (Remaka, Simêla, Hîzka, Xelca.. Yêzîdî jî ne)

Û ji hêla bakur de sînorê Turka ye, nexasim ser sîka tirênê ya tê ji xêza sîka mezin ji Istenbolê ta bi Hicazê (Meke-Hec) dere seranser şamê, ew xeta ji çem bajarê Cerablîs ber bi rohilat ve dere Mûsilê ber bi Bexdê de..

Lê kêsên li Dirbêsi bi cih bûn hêzek Firensî û qîşleh avakirin, û mihete di zîvirandina sîkê ber bi Mêrdînê de heye, û Gumrîk jî hebû bac ji tiştên derbas dibin û tîndîstandin di abûra ticaretê, û jiber leşkerên Firensî ji kesê Fillene. û jiber van kesan abûrî çêdibû û kes dihatin û diçûn ji kesên welat, û hin kesên Fille jî bi cihbûn mîna (mala QereZîwan) aş avakiribûn û hin dikanên wan jî hebûn. Weke tê zanîn berî avabûna Dirbêsiyê, Qreman (Azîza) bajar bû -ango tê wateyê ku dezgehên fermî lê hebûn, mîna (Mudîr û Berîd) hebû, jiber ji sala -1924 xortên Fille daketin û di bin desta HacDerwêş (Azîzî) bi cih bûn, sedem jiber:

zordariya Turkan yê ku di şerê cîhanî yekem tîkçûbû li gelê Fillan bi kîn bûn, dido; jiber desgêra Firensa Fillê li Sûrî nû veqetiya bû diparast,

van Fillê Tora-Abdîn xwe li Sûrî û desgêra Firensa girtin û li Qermanê bi cih bûn, ta sala 1931 an de, û di bin siya HacDerwêş de, û jiber bûyerek pevçûnî û êrîşek talanî li gelê Filla hat û mal û dikanan wan berbat bikin, destûr ji Firensa û destariya Erebb xwestin ku li Dirbêsiyê xwe ava bikin, jiber erdekî fireh heye, tev qîşle jî heye bû parastinê, û jibû asûkê gundiyan tîr bikin..

rabûn wan kesên Fille bi pêşwazek endazî hawirdor dikan avakirin li bingehek xêzin endaziyeke nûjen, û di 1931/10/18 de gel ji Qermanê bi kerwanî bi rêketin û bi cih bûn, lê jibû dîrokê; Kurd jî hebûn di nav wan de, û li sînor qaçax dibirin û tanîn, tişt ji vir dibirin û wir tanîn, ev Kurd tev çiyayê Mêrdînê ne û yê hirême, ji kesên Baravî, Meşkinî, Bêrî, Mûsikî.. yê lêdikirin û avadikirin ango yên bi keda destan dixebitîn.

An yên bar dibirin û tanîn serxetê ta bin xetê. Û her û her kes ji dor, ji çiya, Fille ji gundên mîna (Golî, Minsorat, til-ermena, ji Mêrdîn) lê bi cihbûn, çî Kurd, çî selaxî û tat, û Ermenî jî, her wiha Dirbêsi.. çêbû. Dirbêsi jî deşta Mêrdînê ye, dikeve nav-bera Serê-Kanî ji hêla roava de û Amûd û Qamişlo ji hêla rohilat de. erdê wê rast û firehe, çemekî dem-salî tîr derbas dibe, tê nasîn bi navê (Xwar). Gelê wê abûra xwe dikin bi xwedî-kirina pez û terşan.. û hin ji wan jî bi çandin û kerwanî. Û kermendî fermî. Şirova navê Dirbêsi, di baweriya min de, ji (dera-bê-sî) hatiye. An ji (dara-bi-sî) hatiye..

û dawî jî xwedê zane. Belê, xwendevanê hêja, ne ev babeta



gotara me ye, jibîr bike.. jibîr bike tiştên jorî me gotin. Min diva ser navdarên Dirbêsiyê bêjim, heger destûra we hebe, nexasim hunermendê wênevan, jiber Dirbêsi tevî biçûk-bûn xwe mezine bi şewê jê derketin..

de biborînin ezê navê wan bijmêrim:

- 1 Bişar Îsa (Azîzî) Firensa
- 2 Yakûb Seîd (Fille- Birêhmî) Firensa
- 3 Cemal Abdo (Mîrê Hêkan) (Dêrikî) Almanî Axin
- 4 Newaf Mîkaêl (Arşevîn) (Muhacir) Hollnda
- 5 Selman Omer (Alan Mîro) (Silîvî) Siuêsrâ
- 6 Abrahîm Bişar (Heyderî) (Muhacir) Dirbêsi
- 7 Munîr Şêxê (Ronî Şêxê) (Şêxî) Dimeşq
- 8 Mehmûd Mecdel (Selaxî) Dimeşq
- 9 BehaDîn Hesoy (Necarî) Dirbêsi
- 10 Hîşam Alîko (Hîzka) Kurdistan-Arbîl
- 11 Zekî Necîmo (Bêrtî) Turkiya-Amed
- 12 Kîto Sîno (Saroxa)
- 13 Abdalhemîd Abdallah Almanî
- 14 Adnan Abdilrehman Dimeşq
- 15 Kero Suleuman Dimeşq
- 16 Mehmûd Hiso Swêd
- 17 Omran Yonis Dimeşq
- 18 Reşîd Hesoy Dimeşq


Saadûn AL-SÎNO

# FOLKLORA KURDÎ DI FELSEFEYA SEYDAYÊ CEGERXWÎN DE

kaniya nivîsandina Seydayê Cegerxwîn di toreya zimanê kurdî de, ne tenê bi helbest û çîrokan ve hatiye girêdan belê pênûsa sedayê Cegerxwîn di hemû rengên rewşenbîrî û edebî de cihê xwe girtiye, Bê gumane ko dewlemendî û mezinahiya zimana bi folklor û rewş û pergala tore, rist û nivîsarên wa ye..çî zimanê ko folklor û tore têde fireh û mezin bûne, ew ziman, zar şîwe ji zimanên mezin têne jimartin, Folklor a kurdî gelek dewlemend û mezin û payedare, ko ji her nîfşî «helbest, lawik, heyran, istiran, serpehatî, çîrok û lîztik» dagirtiye...

û ji ber ko kesekî bîr ne dibir ko va «helbest, lawik, heyran, istiran, serpehatî, çîrok û lîztikan» binvîse, gelek ji wan windabûne û ji ber ko gelek diriste ko bîr nivîsandin, seydayê Cegerxwîn jimareke baş ji «helbest, lawik, heyran, istiran, serpehatî, çîrok û lîztikên» folklorî nivîsand û di pirtûkekê de ew civandin, nav û nîşana pirtûkê «Folklor a Kurdî « ye.. Seydayê Cegerxwîn di pirtûka xwe de li ser çend 'helbest, lawik ... hd'.. bi awakî felsefî di axive, ku cara yekemîne folklor a kurdî bi çavekî felsefî tê dîtin, bê guman lêkolînên bi vî awayî zengîniyek pir mezin dide folklor a kurdî.. Ji nav stranên folklorî seydayê Cegerxwîn li ser strana 'Ez Kevokim lê lê' weha axiviye..

EZ KEVOKIM L Ê L Ê  
Ez kevokim lê lê



Kevoka şînim way way  
Li serbana lê lê  
Ez dixwînim way way  
Ji xelkê weye lê lê  
Har û dînim way way  
Ez aşîqê Lê lê  
Çavên şînim way way  
ez kevokim lê lê  
kevoka beşim way way  
li ser bana lê lê  
hûr dimeşim way way  
ji xelkê weye lê lê  
ez nexweşim way way  
ez aşîqê Lê lê  
Çavê reşim way way  
ez kevokim lê lê  
kevoka sipîme way way  
li ser bana lê lê  
xweş danîme way way  
ji xelkê weye lê lê  
ez xwînim way way  
ez aşîqê Lê lê  
jinka bî me way way  
ez kevokim lê lê  
kevoka nêrim way way  
li ser bana lê lê

xweş diÇêrim way way  
ji xelkê weye lê lê  
ez newêrim way way  
ez aşîqê Lê lê  
jinka mêrim way way

Berî her tiştî mûsîqa wê di Rojhilatê Navîn de deng daye. şeş tevger têde hene û pir bi sivik, tê gotin, Heta mirovên biyanî jî pê dilxweş dibin û bi ser xwe de dipûjînin û guhdarî dikin. Çawa ko bi dengê Hesên Cezrawî ketîye qawan û şerîtan û hatiye belavkirin. Hesên gelek xweş û sivik dibêje; lê mixabin ko gelek Çewt û şaşîyan têkel dikî û ji cem xwe jî li ser zêde dikî û ne rast dibêjî. Lê ne guneh û sûcê Hesene, ji ber ko, kore û nexwendî ye divabû bihata nivîsandin û jêre bihata xwendin û gotin.

Bi rastî, dengê Hesên Cezrawî gelek xweş û hêjaye, lê ji ber ko ne xwendîye, nikarî berpêş gavên di vî meydanê de bavêjî, Çawa ko mûsîqarê kurmanç, nûjen peyda nabin û mûsîqa kevnare hew bi kêrî guhê mirovên Sedê Bîstem tên, Hesên dibêjî: «kevoka dînim», lê divabû bigota: kevokê dînim, ji ber ko kevokê nêr aşîqê Kevoka mê dibî, Çawa ko dibêjî: «ez aşîqê lê lê Çavê şînim» û li xwe vedigerî û dibêjî: «Ez maşûqê lê lê Çavê şînim way way». Gelek diriste, ko em bi Çavê felsefî lê binêrin, ko seydayê Cizîrî gotiye:

«Aşîq û maşûq yekbûn, şeme û hem perwane bû», lê ev diriste, eger em xwedênas bin û dikarin wê Çaxê bibêjin:

# Pênûs û pirtûk

«xwedê Hem aşiq û maşûqe», lê di mirovan de ev hinek diware. Lê seydayê Cizîrî, di berya vê ristê de dibêjî: «Berî ko ev cîhan, sitêr, Çerx, tevger peyda bibin jî, îşq hebû. Lê eger yek jê bipirsî:

ev cîhan nebî, Çawa wê aşiq û maşûq wê hebin? Seyda di bersiva wan de gotiye: «Herdû jî yek bûn û herd û jî xwedê bûn» yanî xwedê Weke findê ronî didî û weke perwane xwe dişewtênî, Lê ji ber Hesên ve, bi awayê felsefî, dikarin bersiv bidin û bêjin: Mirov hem aşiq û maşûqe û tev ji hev hez dikin yan jî, ji ber ko, jin û mêr ji hevîn û di koka xwe de mirovanî hemû yeke, diriste, ko aşiq û maşûq yek bin.

Çawa « Çav şîn» di awira kurmanca de ne gelek şêrîn û xweşikîn, herwekû di «ÇaÇanê» de hatiye gotin: « Çav şînê, Çav şeytanê» û carna kurmanca dibêjin « Çav pisîkê», ji ber ko pirên kurdên welatê me Çav reşîn û ji Çavên reş yan belek hezdikin û istiran û dîlokan li ser dibêjin.

Lê bestebêjê me, weke kelokorê Alîya lê hatiye, ko dibêje, careke aşiqê Çavên şîn û careke aşiqê Çavên reşe; carna aşiqê jina bî û carna aşiqê jina bimêr, ji lewra tê bîra min ko ev dengbêj mirovekî xwedî kemaçe ye û di ber govendê Re diÇî û tê û dixwazî dilê dîlanvane tevan xweş

Kawa Heso

(Hozanê Girkundê)

Her hest dimîne hest, û her bêrikirin dimîne bêrikirin, lê bi gihiştina herdu layan evîn çêdibe an helbest diafrin.

Bi rastî, pir şêwên helbestê hene, çi sazêş be, çi pexşane be, yê tê nasîn bi navê (helbesta nûjin). Bilê, û pir naverokê wê jî hene, ev bi xwe aloziyeke helbestiye, her hozanek hest û nêrîna xwe dinivîsîne -weke terzê nivîsîna wêjeyî- çi bi şêwê stranî be, an çi bi şêwê evînî û xuristî be û welat-parêzî be mîna babet.

Her wiha em dixwazin di derbarê pirtûka (Vehêsinêk liber delavên dilberê) 2006, ya helbestvan Hozanê Girkundê, du peyvan bêjin: Bi xwe pirtûk ji 96 rûpelane, û bi 49 perçe helbestin, û bi pêşgotina helbestvanê hêja (Bêbuhar) pêşkêş bûye.

Belê, helbestên pirtûkê bi du şêwa hatiye nivîsandin, beşek ji 26 perçan sazêşî, û beşek ji 23 perçan nûjen û pexşanî, helbest bi herdo beşên xwe stran û evînîne. Evîniyek çak û paqije, heger dervayî pesnê yarê ne, lê pir bi wêne û bi pergalin ev rist û pexşane, bi hestên durist hatine hunandin, weke Bêbuhar dibêje di pêşgotinê de: (Bi ramanê kûr û bi pênûseke mîna şûr tîpên kire gemî û li derya helbestê siware, li kenarê vehesîna peyva Kurdî dil bi şewate).rp 3.

Di bal naverokê de, pir giran-buha heye, mîna hevqirtina yekîtiya helbestê ji gotina pêşîn ta bi ya dawîn, yekser bi babeta xwe veye, ne ev tenê jî balê dikişîne, ew wêneyên hevokan pev girêdidin,



wêneyên weke dibêjin (hêsan û biyan) herkes têdigihê, lê herkes nizane bîne ziman. emê çend mînakên bidin xuyanî:

- Mîna siya rokê, li pê dûmana rojan, şepolan dide kenarê. rpl 24

- Mirin zindiye di rageha tede, û êşkencî pîroze di nêv destê tede. rpl 26

- Tû nehêle, ez dîsa ji dergêhên dûrîyê, nêzîkbûna te pars bikim. rpl 33

Wiha ta dawî, di herdo beşên helbesta de, her ev nimûnak biçûke ji derya pirtûkê, li dawî vê perçe helbestê pêşdikim:

Şevek Xemgîn

Di vê şeva xemgîn û bê deng de, Tenê ez û çend sitêrên birîndar bûm

Dengê te xwe tevî şevbihêrkê kir Ji nûve penceriyên dil vebûn Jibo evîneke veşirtî

Mîna ewrekî hevqirtî

Xwe li min pêça.

Lê divê ez têbîniyekê bidim, hin şaşiyê nivîsa çapê hene, lê ev nabe sedema kêmaniyê.. ku derênan bi cih nehat mîna bê neveroke, û beş ji hev nehatin cudakirin..

Dawî, hêjaye gotinê ku Hozan du pirtûkên wî yê din hene:

\* Evîna vejandî – 1997.

\* Ne payiz daristanan diweşîne. 1999.

Ciwanê ABDAL

# Nîşanên Nexweşîya Şekirê

1 Nîşaneya yêkê, eger berdewam tînî bî û avê vexwî û berdewam cîye destavê, her wusa eger bi şevê ji xew şîyar bî bo destavê.

2 Eger şekira te gelek bilind be, ew dê bibe egera kêmkirina kêşa mirovî. Nêzikî 4.5 heta 9 kiloya dê 2 mehan kêmkî, belê evê ne bi rengekî saxlem e.

3 Nîşaneya 3ê ya nexweşîya şekirê, demê mirov ji nişkêve gelek bîrsî be evê dê bibe eger ku astê şekirê an gelek bilind an jî gelek kêmkî be.

4 Jiber ku xwîna mirovê baş neyê û biçe, pêstê mirovî gelek dibixorîyê an jî zêde hişik dibe.

5 nîşaneyekê dî ya nexweşîya şekirê ew e ku leşê kesekî zû çênabe, ji birînekê an jî ji kulbunê.

6 her wusa kulbuna nav leşê mirovî nîşaneyekê dî ye, bo nimone, kulbuna hinava an devî.

7 Demê kesekî astê şekira wî ya bilind be, gelek hest bi mandîbûnê dike û ew westîyan berdewam dike.

8 Eger bînahîya çavên mirovî ji nişkêve kêmkî bibe an jî car bi car ronahîyeka tûj bibîn, ev nîşaneya aste şekirekê bilind e.

9 Sarbun û glizanga dest û piyan û her wusa êşan û werimtîna wan, jiber hindê ye ku nexweşîya şekirê zîyanê digehîne rehên dest û piyan.

10 Ya ji hema giringtir ew e ku pitir ji carekê fehse xwînê bête kirin heta bizanin ka mirov tuşî nexweşîya şekirê bûye yan ne.



Her sal pênc milyon kes bi cigaran dimirin. Li nav raporteka li ser kar anîna tutînê, ajansa ser bi Netewên Yêkgirtî ragehand ku nêzikî 95 li sedê ji xelkê cihanê bi qanûnên berband kirina cigare kêşanê na hêne parastin.

Rêxistîya Saxlemiya Cihanî da zanîn ku her sal nêzikî 600,000 kesên ne cigar kêş lê dukêla cigara li dewir û berên xwe heldikêşin, dimirin.

Raporta rêxistiyê çend stratejî diyar kirin ji bo kêmkirina cigare kêşanê, parastina xelkê ji dukêla cigaran, berband kirina rêklamên cigaran, û zêdekirina bacê li ser berhemên tutînê.

Rêxistîya Saxlemiya Cihanî sala borî ev stratejiyê aşkira kirin, lê kêmkî tir ji 10 li sedê ji xelkê cihanê li jêr parastina wan pilana ye.

Kar anîna tîtinê eke ji sedemên serekî yên mirinê ku bersîng girtina wê momkîne û Rêxistîya Saxlemiya Cihanî pêşbînî dike eger welat bizavê neken, çêdibe kar anîna tutînê bibe egera mirina heşt milyon kesan heta sala -2030ê, û piraniya wan li welatên pêşvedîçin dijîn.

## Mûzîka kurdî û amûrên wê (2)

**D**i vê jimarê de ji Welat û di beşê hunerî de em ê dê li ser amûrekê din ji amûrên mûzîka Kurdî bi axifîn, ku xwedî cihekî taybet û pîroz e di malbata amûran de ew jî Bilûr e.

Bilûr :

Amûreke ba ye, wekû flûta kurdî tîye naskirin, û kesayetiyê kurdî ya zelal tê de xuya dike. Û tevî ku bi (Amûra Şivanan) tê naskirin, lê di jenîna miqaman de jî cihekî xwe yê girîng heye, herwiha di ola Êzdî de jî, bilûr bi defê re di gelek rêwresmên olî de tê jenîn ji hêla Qewalan ve.


Dirêjahiya vê amûrê nêzî 70cm, û tê guhertin li gorî tonên muzîkê, wiha gerek 7 bilûr peyda bin ji muzîkjen re. Bilûr 7 qul jê re hene li jor, û qulek li jêr, û di bilûra klasîk de du qul li dawîya bilûrê hene wekû (qulên şeytên tîne binavkirin yan, yek ya şeytan

û yek ya Îmamê Elî). Lê, cudabûna vê amûrê ji Nay(Ney) ew e ku bilûr ji textê mişmişê, gûzê yan tûyê çêdibe lê, ney tenê ji Qamişê. Herwiha, bilûr 10 qul tê de hene lê ney 6 li jor û yek li jêr e.

Ji aliyê miqaman ve, bilûr hemû cureyên muzîkê lê dide, bi taybetî, muzîka destanan. Û bêhtir ji neyê dikare kesayetiyê Kurdî bîne ziman. Bilûrvanên herî binavûdeng di nav Kurdan de:

Tahirê Imer, Egîdê Cimo(ji

### Bilûr(C:Do)



Yerîvanê), Yasîn Boyraz(Bakur), Ebdurrehman Dirêî(Rojava). Bilûr li Tirkîyê û Bulgarya û



Belqanê bi Kaval tê binavkirin, lê li rojhilat, bi navê Şimşal tê naskirin. Lê, bêhtir ji hesin çêdibe, û 6 qul tê de hene, û dirêjahiya wê jî 53-47 cm, û dûrbûna qulan 2.5-2 cm. Şimşal çend miqamên girîng dibêje wekû: Pîr helo, Mem û Zîn, Xorşîd û

Xawê û Xecê û Siyamend. Şimşaljenê herî binavûdeng, Qale Mere ye(Qadirê Şivan), navê wî yê rast Ebdulqadir Ebdullahzade ye, û ji bav û kalan de li Şimşalê dide.

Ronas Shêxmûs & Îmad Talatî

# فن ادارة الوقت

« إن الزمن هو الحركة فلا زمن بدون حركة وإذا توقفت الحركة توقف الزمن »

فالكون عبارة عن حركة و الشمس لها نظام حركي معين، فهي تشرق علينا في وقت منظم ومحدد آلا وهو وقت الفجر ، وبشروق الشمس تتفتح النباتات بحثاً عن الضوء وهنا سؤال يطرح نفسه ..إذا تأخرت الشمس في شروقها هل سيختل النظام الكوني ؟.. بكل تأكيد سيختل والسبب في ذلك أن الكون بأكمله مرتبط بالوقت فهو قائم على أساس انتظام الوقت كسنة من السنن الإلهية التي وهبها الله لنا .

فالوقت من أهم الأمور في الحياة وله الصلاحية أن يأخذ المرتبة الأولى وكلنا نعلم بذلك لذا لا بد لنا أن نستفيد منه في تنظيم أمور حياتنا وأولوياتها ،فوقت الفراغ مثلاً هو وقت مهدور وغير منظم ولا يخدم الاستثمار والإدارة بشكل صحيح فالإدارة المنتظمة للوقت تبدأ من غرفتك ، نمط حياتك ، تنظيم أوقارك ، انجاز مهامك . إدارة الوقت بشكل صحيح في الحياة ترسم طريق مستقيمة لصاحبها وتسهل عليه الدرب في التقدم



والتطور أما الوقت الغير المنتظم فهي أشبه بسفينة في عرض البحر نتقاذفها الأمواج يمينا وشمالاً ولا تؤدي بصاحبها إلا إلى القاع المظلم الذي لا وقوف بعده.

وأهمية الوقت لا تكمن في المصطلحات التي نتناولها فحسب بل كل ما هو مسير في تنظيم الحياة لأننا جميعنا ندرک إدراكاً عميقاً بأن القليل منا فقط هم من يستثمرون هذا الوقت في مصلحته ومصلحة الآخرين.

فكل الشعوب المتقدمة لم تصل إلى هذه المرحلة من الرقي والازدهار إلا من خلال الإدارة السليمة والوقت المنتظم ، فقد استغلت الزمن بكل إشكاله في سبيل خلق إنسان مفعم بالحياة وقادر على تطوير أسرته ومجتمعه.

وطالما كل فرد منا يملك العقل والتدبير فهو يستطيع بيده أن يسقي بذرة الوقت في نفسه لان التخطيط الفعال والمنتظم هم وحدهم من ينيرون دروب النجاح فمثلاً :

إذا كنت على موعد وسياخذ هذا الموعد من وقتك قرابة ٣ ساعات ولكن تم الاعتذار عن الموعد من قبل الطرف الآخر فهنا لديك ٣ ساعات فارغة ولكن هل هناك خطة أو تفكير لتنفيذ أمر ما في وقت فراغ غير معين ؟..إذا لم يكن لديك الفكرة أو الخطة لا مشكلة تستطيع في غضون ثلاث ساعات أن تنجز أي شيء يعود عليك بالمنفعة ولكن الأهم أن يكون لديك الإرادة والصبر لذلك.

فيمكن لك مثلاً عزيزي القارئ أن تكتب جدولاً زمنياً لأسبوع واحد فقط ثم تبدأ بتنفيذه خطوة بخطوة .

كأن تقوم بتدوين مهامك في هذا الجدول مابين الهام وغير الهام ، الطارئ وغير الطارئ أي حسب الأهمية والأولوية وتحديد ساعة واحدة يومياً لما قد يحدث خلال هذا الأسبوع من حالة طارئة أو تغيير موعد أو

أي خلل يمكن له أن يحصل في هذه الفترة. فالانتظار أمر فاشل وقاتل في نفس الوقت والتفكير بأن لدي وقت ثم التفكير ماذا سأفعل معادلة فاشلة تأخذك إلى متاهة الإحباط والتخبط الذاتي .

إذا فالأصح هو وضع نموذج متكامل لمدة أسبوع مع التقسيم في نهاية الأسبوع بالإنجازات التي تحققت وتحديد نسبة الفراغ التي حصلت في هذا الأسبوع.

كل ما ذكر لا يعني أن تكون حياتنا كلها عبارة عن عمل مستمر وإنما يجب أن تتخلل أوقات العمل فترات من الراحة والاستجمام لإعادة النشاط الذهني والبدني للإنسان . فوائد إدارة الوقت:

أكدت الدراسات الحديثة أن الإنسان الذي يقوم باستغلال وقته بشي نافع هو من أكثر الأشخاص سعادة ويتمتع بالهدوء النفسي. فإذا أردت أن تحصل على سعادة حقيقة فاعلم كيف تستثمر وقتك ولا تجعل نفسك تبعاً للظروف المحيطة بك.

فقد لاحظت من تجربتي الشخصية أن الناس الذين لا يستخدمون وقتهم بشكل منظم تراهم غير راضين عن حياتهم وينتابهم شعور الملل والضجر وفي الحقيقة هذه المسألة تسبب مشاكل نفسية قوية لا تقل أهمية عن الآلام العضوية .

وتحقيق الهدف هو من أهم نتائج الوقت المنتظم فالشخص المنتظم تراه شخص ناجح في جميع الأصعدة ومتزن عاطفياً وجسدياً لأنه ينظم وقته ولديه وقت كافي للقيام بإعماله الترفيهية والاستفادة من وقت الاستجمام والراحة أكثر من غيره.

لو أردنا أن نعد فوائد الإدارة الفعالة للوقت فإننا نحتاج إلى كتب لا إلى مقالات ولكني اختصرت عليكم ما هو الأهم وأتمنى أن تستفيدوا من وقتكم فيما يرضي الله والمجتمع فريضاء الله هي رضاء النفس أيضاً.

# تربية الطفل بين الحساسية و الخطورة

مشاعر الطفل رقيقة، حساسة، سريعة الخدش، وإن كنا نجده ينمو، ويتطور، ويكبر، وقد لا تظهر بعض الآثار السلبية عليه على نحو سريع، إلا أنه يعد من أكثر المخلوقات على وجه الأرض حاجة للرعاية والاهتمام، وحقيقة، فإن الطفل يمر في المرحلة الأولى من نشوئه بالعديد من التطورات، حيث يكون أكثر تأثراً بمحيطه الخارجي، وذلك خلال السنة الأولى من عمره، إذ يتطور في شتى المجالات، بشكل سلس في ظل وجود الرعاية الكافية، يتأقلم مع بيئته و يتفاعل معها يتأثر بها، بل ويتطبع بمحيطه الخارجي، على اعتباره سريع التأثير بالآخرين، إذ أنه يمتلك قدرات كبرى، تجعله يلتقط هذه الإشارات التي تصله ممن هم حوله، ويتمثلها. لذا فإنه على الأسرة الاهتمام به، بشكل خاص، وعدم إهماله، ومنحه الرعاية الكاملة، وأهم كل ذلك الحنان، لتغذية عاطفته، كي تكون متوازنة، والابتعاد عما يجرح أحاسيسه، لاسيما من خلال الحذر من استخدام الكلمات النابية في التعامل معه، والابتعاد عن الإشارة إلى عيوبه الشكلية، إن وجدت، ومنها: الطول، الحجم.. إلخ، وعلى الأبوين أن يعلموا أن تحديد هدف الطفل الحياتي، من قبله، ومعرفة درجة إمكاناته وقدراته غير واضحة، في هذه الفترة، لاسيما وأن لكل شخص عالمه الخاص الذي يميزه، يتوجب عليهما ألا يكثرنا بهذه الأمور، في هذه المرحلة، بل الانصراف إلى التخطيط الاستراتيجي، لتربية طفلهم، على أكمل وجه.. إن تقريع الطفل في تصرفاته، و التركيز على توجيه الملاحظات على هيئته و ملامحه، يمنعانه من تحديد موقفه في الحياة، و يجعلانه مفرط الحساسية، بسبب الشعور المقلق تجاهه، إذ أن هذه المرحلة هي التي تنشأ فيها ملكة الثقة بالذات، في إطار نمو شخصيته العامة، ليكون فرداً ناجحاً لا يهاب الفشل. لذلك فإنه لا بد من إيلاء عامل التربية الطفلي الاهتمام الكافي، ناهيك عن ضرورة التعويل على تطوير المناهج التدريسية، حسب المراحل العمرية المتدرجة، كي تكون

وفق أسس تربوية متطورة، ليتحقق شعار «لا رسوب للطلبة في المرحلة الابتدائية»، فالغاية التربوية ليست تلقين اللغة، وتعليمه الكتابة الآلية، بل القضية ليست مسألة نجاح أو رسوب، وإنما هي بناء الإنسان من داخله، وهي أصعب صناعة في الحياة، وإن كان بعضهم يسترخصها، و إذا علمنا أن اليابان من الدول الصناعية العظمى، فإن التطور في مناهج التعليم لديهم قد تخلص من مرحلة رسوب التلاميذ في المرحلة ما بين الأول الابتدائي إلى الثالث المتوسط، لأن الهدف-الرئيس- هو التربية و غرس المفاهيم في روحه، و عمارة الشخصية لديه، وليس فقط التعليم والتلقين، وهكذا فإننا نرى في البلدان التي تخطط للعناية بالطفل، و تسعى لغرس القيم الإيجابية في نفسه من حب للحياة، سينعكس ذلك على نحو مباشر، وسنلاحظ كيف أن مجتمعاتها تتطور، وتحقق إنجازات كبرى لأمجال للحديث عنها، لأن كل ما قامت به تجاه تربية أطفالها، انعكس بشكل إيجابي عليها، على الأغلب، حيث يتم إعداد جيل سليم معافى. أما في البلدان التي تعاني من سوء التخطيط و العناية بالطفل، فإن الأمر لينعكس سلباً عليهم، ما يؤدي إلى عدم القدرة على ضبطهم، و بتربية الطفل، وإهماله، نتيجة الجهل و عدم التفاعل الإيجابي مع وسائل الإعلام، و قديكون وجود الخادمت الأجنبيات في البيت، عاملاً سلبياً، لاسيما بالنسبة إلى اللواتي ينحدرن من ثقافة مختلفة، مناقضة لثقافة بيئة الطفل، و قيمها، كما أن الوضع الاقتصادي المزري لأية أسرة، يؤثر سلباً على الطفل، لدرجة أنه يفقدها قدرة السيطرة على الإسهام في تربية النشء الجديد، ومساعدته على تحديد مستقبله و هدفه، من خلال فشلها في المهمة المسندة إليها.

ومن هنا، فإن على الأسرة أن تدرك أن أخطر ما لديها هو تربية الطفل، وإن أعظم ما تحققه هو أن تسهم الأهل زرع القيم النبيلة و حب العمل و الاعتماد على الذات في نفس

طفلها، كي لا يتعرض-مستقبلاً- لعواقب ومضاعفات سيكولوجية وخيمة، وليتحلى بروح المسؤولية عن كلمته و تصرفه، ففي تجاهل الطفل، من قبل المحيطين به خطر فادح كي لا يصبح الطفل شخصاً أنانياً، يبدوله أنه يعيش من أجل ذاته، فتتضخم أناه، مفتقداً الصلة بالواقع، و بأي أحد، وهونتاج فشل القيم الأسرية...!

وثمة طرق كثيرة تهيئة الطفل للتواصل مع مجتمعه، وهومهمة من حوله بالدرجة الأولى، بدءاً من الأسرة ومروراً بالمجتمع والمدرسة، وعلى مربى الطفل أخذ الحيطة أثناء تربيته، والانتباه إلى خصوصية الحالة السيكولوجية عند بعضهم بشكل استثنائي، إلى جانب ضرورة أن يتم تزويد الأطفال بمعلومات عن التواصل الاجتماعي و توثيق عرى التواصل والحب، في أنفسهم، إلى جانب سلم القيم الكثيرة، ومن بينها حب العمل، وتعويدهم على إدراك مدى أهمية الوقت، ليحرصوا على أوقاتهم، لأن العلاقة مع الوقت من أهم شروط النجاح لدى الإنسان، منذ طفولته، وحتى اللحظة الأخيرة من حياته.

ولابد من الإشارة هنا، أنه من الضروري الابتعاد عن أساليب العنف في التربية، سواء أكان ذلك في البيت أو المدرسة، أوحتى الشارع، وتقع على كاهل الأبوين والمعلمين والمجتمع ضرورة تنفيذ ذلك، وهي جزء من ثقافة «حقوق الطفل»، المعتمدة عالمياً، والتي يجب على كل من حول الطفل، معرفتها، والإطلاع عليها، بل إن من واجب الدولة تنفيذها، بالإضافة إلى أن توطيد العلاقة مع الطفل يحقق خاصية الثقة المتبادلة بينه ومحيطه، وكل هذا لا يمكن أن يتحقق في ظل حاجة فشل الوالدين في تأمين أسباب المعيشة والحياة والدراسة، وتوفير الرعاية الصحية، حيث تتشابك هنا، مسؤولية الأسرة مع مسؤولية الدولة التي يقع عليها تنفيذ كل ذلك، ولاسيما في ما يتعلق بمسألتي التعليم والصحة، بل وحتى الحياة الكريمة له ولأسرته.

## الابجدية الكوردية

### كلمات الطبيعة و ما يقابلها باللغة الكردية

kurd : الكورد  
leheng : بطل : لا هَنغ  
mêr : رجل : مِي ر  
nerm : لين : نَرم  
OL : دين : اول  
pirtûk : كتاب : پِرتوك  
qels : ضعيف : قَلس  
rûmet : شرف : رومات  
sipî : ابيض : سِبي  
şer : معركة : شَر  
tîn : حرارة : تين  
xunav : المطر الخفيف : خوناف  
nû : جديد : نوهُ  
kevok : حمام : كَفوك  
wî : هو : وِي  
xurt : قوي : خورت  
yek : واحد : ياك  
zêr : ذهب : زِيه ر

Kevir \ صخر  
Zîpik \ بَرْد  
Dar \ خشب  
Hesin \ حديد  
biyaban \ صحراء  
Gir \ تل  
Daristan \ غابة  
Kendal \ وادي  
C : caw : قماش : جاو  
çav : عين : چاف  
D : dar : شجرة : دار  
e : evîn \* : عشق : افين  
ê : êlûn # : ابلول : ايه لون  
F : fermo : تفضل : فَرمو  
g : gore : جوارب : غور  
h : heft : سبعة : هَفت  
dîl \* : ا قلب : دِل  
în : آ : جمعة : اين  
jîn : ج : حياة : ژين

asîman \ سماء  
Roj \ شمس  
Tarî \ ظلام  
Heyv \ قمر  
Çiya \ جبل  
Toz \ غبار  
Baran \ مطر  
Berf \ ثلج  
Kûr \ عميق  
Zerya \ محيط  
Derya \ بحر  
Çem \ نهر  
Deşt \ سهل  
Mij \ ضباب  
şevnem \ ندى  
Stêrk \ نجم  
Girav \ جزيرة  
Brûsk \ برق  
Volkan \ بركان

## احاديث في الثورة

بدو قدم تدوس على رأسه و سجان يكبل ايدو» فهو لا يفهم معنى الحرية .

لكن الاخر اجابه وقد اعماه الغضب فصرخ ألا يكفيننا ما عانيناه حتى الان وعندما نحاول استرداد انفسنا تجملون الوجه القبيح لحكامنا فالفساد لا يمكن أن يكون وليد اللحظة الراهنة بل هو نتاج طبيعي لنظام عاش على الفساد وانتج المفسدين.

فمن الظلم والاجحاف ان تلصقوا الفساد بالحرية. وفي الحالة السورية حيث الفساد كان عنوان هذا النظام فمن المنطقي جدا بروز هذه النفوس الضعيفة لتغش وتسرق وتتهب وتكذب وهذه النفوس هي جديدة قديمة. لأنه من غير الممكن للشرفاء أن يسرقوا و يتهبوا وهم الذين عانوا الامرين من الظلم والاستبداد. وكما الحال في ((الاتجاه المعاكس)) اختتم الحوار بدون اية نتيجة. فالأحرار والشرفاء سيعانون لتنشئة الشارع الذي اوسخه النظام بقيمه واخلاقياته وصبر الشرفاء هو الضمان وسورية قادرة على إنجاب الملايين من الاحرار الذين سيزرعون الأمل والحرية في دروب أطفالها وشبانها.

من رحم الثورة يولد الشرفاء ومن رحم الحروب يولد المفسدون. أحاديث كثيرة تدور في الشارع عن المفسدين الذين يتاجرون بلقمة الشعب من المواد الغذائية الى الغاز والمازوت... كل شيء مفقود في الاماكن المخصصة لها وتتوفر عند مفرق كل شارع ورصيف بسعر يوازي سعر الدولار . وكأنه قدر لهذا الشعب ان يعاني خمسون عاما من الظلم والاستبداد وحينما تحين الساعة ليسترد حريته و يعبر عن حقه في العيش الكريم ينبعث من جوف الحوت الاف الحيتان لتنهش في لحمه وتنقض على انفاسه .

جدل كبير دار في الشارع حول هؤلاء المفسدين ... وساحة الحوار لم تكن إحدى الشبكات الفضائية بل شارع مظلم هرب سكانه من وحشة ظلمة البيت الكئيب ليتسامروا على ضوء القمر بعد أن تنفسوا الصعداء لانتهاى موسم الشتاء البارد حيث لا مدفأة ولا كهرباء..

بدأ أحدهم الحديث على طريقة الاعلاميين فقال : «يا أخي الشعب كله فاسد الكل يغش ويسرق وينهب بلا حسيب و لا رقيب شعبنا

نور الكردي

# Xweş nûçe

Telîfonkir û got xweş nûçe  
Xweş tire ji banga melê û  
xoce  
Û xwendina kewan her sibe  
Lê nizamim çawa bêjim, jibo  
te

Dengek hat nerim û awerte  
Tijî fedî û şerme û hest e  
Erê erê .. ez hezdikim ji te  
Ji hana bêtir ez nikanim  
baxvim, niha tev te !  
Min got:



Çi şad û şêrîne ev nûçe  
Ez heyran vê nûçê ji devê te  
Hezar carî sipas jibo telîfona  
te  
Tu ji min şêrtirî, ez dilê te  
Ji min şadtir nîne niha bi serê  
te  
Tu her li ba minî û ez li ba te  
Ez çel salîbûm û niha ez bûm  
panzdeh!

Beyar Robarî

# Xaçerêk

## rast

navê derhênerê filmê Kerî û-1  
.filmê Rê  
.mirov(vajî)--- fermanîdar-2  
.hinarkê rû--- dijî şer(vajî)-3  
dijî nenas---alava çayê tê de-4  
.dikelînin  
.birayê bav---dijî nezan-5  
.endamek ji laş---du tîp ji (tirs-6  
bajarek dikeve rojavayê-7  
.Qamişlo yê(vajî)---dijî çep  
devera bilind(vajî)---paşnavê-8  
.helbestvanekî Kurd(vajî).---9  
alaveke kevin a cot.navê şêxê  
.Ezîdîyan  
dijî germ---serkêş û -10  
.fermandar

## serjêr

navê pêxemberkî bi zimanê-1  
(lawiran dizanî(vajî  
.parçayek ji tiştêkî---dijî nema-2  
sêbeyreq(vajî)---bajareke li-3  
.Bkurê Kurdistanê  
s.m.m(belavkirî)---alava-4  
.axiftinê  
.dijî erê(vajî)---kar û tevger-5  
dijî sûde(qezenc)---du tîp ji-6  
.((serok  
.navê şanoyê bi Latînî-7  
hêvî---yarê Mîdiya di çîrokeke-8  
.Cîgerxwîn de  
wela-teke di rojhilata navîn de-9  
.((ye---tîpin ji (kapîtal)(belavkirî

Îmad Talatî

|    | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 |
|----|---|---|---|---|---|---|---|---|---|----|
| 1  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 2  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 3  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 4  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 5  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 6  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 7  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 8  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 9  |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |
| 10 |   |   |   |   |   |   |   |   |   |    |

# Albeydda



Ji bo komkujiya Banyas. Albeydda...  
Serê xwe ji pakrewanan re xûz û xwar dikim...

E. Z

Em hov in

Mirîşk in, an Mirov in?

Çi wijdanê bê çav û bê dev û raketî...

Ta bi ta min ji dirindiya xwe vekin...

Ez kurmekî kirêt im,

Mirovantiyê êdî bes li min binêre...

Min buhişt û horî ji mêj ve ji bo we  
hiştine...

Her lqalekê serê we bixwe.

Girafêteke rişmekirî we sêdar bike...

Şûşeyeke mey ji xwîna kevnare, hişê  
bêdad ditevizin e...

Hawar gelo ev çi bêdengî ye?

Ev çi gulofîtikên laşên mirovan in, an  
Bexên cejna Qurbanê ne...?

Erebino!

Hûn ji pîneyên pûştan hêj derneketine?

Misilmano!

Hûn ji şikefta xewarbûna xwe  
derneketine...

Wax... wax...

Pezê cangorî kerî û ref ji bo mirinê têne  
ajotin!

Ey dunyayê,

Ey bêbextê,

Xew şêrîn e...

Xwîn diherike...

Kulîlkên li ser keviranên dilan hêj li hêviya  
çipikên xunavê dijîn...

ezîz xemcivîn

# Çîroka PENABEREKÊ



Carcaran rojev ji mirov bihêztir e, ji wê tu mirov dibîne neçar dest ji hemû tiştan diberde û rêya çareyekê dişopîne, da mayîna xwe bi cih bike û giyana xwe biparêze. Tevî ku li pey xwe gurzek ji bîranînan dihêle û kedkariya salan wisa ji ba re berdide. Perwîn keça biçûk a ku bi leystokên xwe rewşa buhara gundê xwe dixemiland, dema ku ew li hemberî xaniyê ji kelpîçan di hêlanê de xwe dihejand, Diya wê çente yê rêwîtiyê amade dikir, û li hêviya tariya şevê bû ku bikarîbe ew û keça xwe tevî komên rêbwaran bibin û ji gundê xwe yê li Dêrikê derkevin û ber bi bajarên çadir û konan ve biçin. Bi kirasekî xemilandî ji rengên pembahî yê çirisandî, yê ku diya wê ji bo roja Newrozê ji wê re amade kiribû, Perwîn ew ê dest bi rêbwariya xwe bike digel diya xwe û çend rêbwarên din. Bi kenê xwe yê sivik ji lêvên biçûk mîna nîgarek e xwezayî, Perwînê guman dikir ku ew ê dê şahiya cejinê digel mirov û hevalên xwe li dar bixin, û qet nedihat holê ku ew ê dê di konên koçberiyê de Newroza xwe biqedînin. Bi hatina sawîra tariyê, kerwan dest bi maşê kir ber bi rebeniya xwe ya nû ve û bê nasnameyek xuyayî, ji ber ku rewşa wan diwartir e ji berxwedana nerînek zaroktî, yan jî ji riwê kalemêrekî di nava salan de por û rih

sipî kiriye. Asîman kirasekî reşî tarî li bejina xwe kiribû, dema ku koma penaberan di nav têlstiriyên de dibuhurîn, bê guhdan ji tarî û serme ya ku hin bi hin xwevedizîne laşên bi tiris, û di heman demê de jî Dayikê raza sedema vê derçûyîniyê qîza xwe veşartîye. Tenê Perwîn bi kenê xwe li ser lêvên tenik bi hêviya ew şahiya ku di xeyala xwe de çandiye. Ew şahiya ku destên xwe vekirîye da pêşwaziya mêhvanên xwe bike di bin siya baskên Newrozê de. Di dema meşê de ronî ji ronîgehan yekcaran rewşa wan aloz dikir, Dayikê bi gavên bibawerî li pêş diçe, û hewl dide ku tiris û tengîjîna Perwînê dûrî wê bibe, bi çîrokên li ser rojên xweş ên ku tîr piştî derbaskirina sînor... lê ew ê zarokê qet nizanibû ku ew rojên geş çûn û êdî nema vedigerin. Bendewariya tirsê zor e, û zordestî digel naçariyê re pir bi êş e. Xewnên Perwînê hêdî hêdî belav dibin, bi nêzbûna Komandan û Leşgerên wî, û bi ronîkirina cih, dîmen xuyabû, xelkin li ser geyayê rawestiyane, û tirs çavên wan kiriye meydana ji gumanan. Sînor derbaskirin, lê xwena keça şeş salî ma li gundê wê.... ev konên aniha li pêş wê ne, ne konên Newrozê ne, ev konên penaberiye ne.....

Şilêr Reşîd

# rojîn

Berf û pûk bû li doraliyên Çiyayê Şengalê, Ehreman dîsa hêrs bû bû û asîmanê welêt bi ewrên dagirtî mişt kiribû. Rojê xwe veşartibû, hîvê koç kiribû û stêrkan xwe di kûraniya gerdûnê de wenda kiribûn. Mirina reş xwe berdabû nav gundên Kurdistanê, Ezraîlê Mewtê derketibû nêçîrvaniyê, tîra xwe çep û rast diavêt: Ne digot ev zarokêkî biçûkî bêtawan e, ev keça yeke xweşik û delal e, ev ciwana hîn neketiye panzdehane, û ne jî haydarî dida girî û şîna dayan. Bi dilekî polatî can dikişand ji giyanên çelengan, ji bedena egîdan û ji laşên pîr û kalan. Bi hezaran termên reş li ser berfa spî bû bûn para gurên birçî. Erê, di goristanên stana Kurdan de dîsa cîh nemabû. Û êlan şîn danîbûn, jinan reş girêdabûn, zarok bêday mabûn, day bêzarok mabûn û te digot qey xweristê xwe xistiye nav razaneke bêyî dem. Di rojeke dawîya zivistana vê salê de bû ku ez rastî te hatim, sê salan li dû şkestina Serhildana Bedirxan Begê, di 1849an de. Tu çelenga devera xwe bûyî, Rojînê; tu benîştê devê xortan bûyî, tu meraqa dilên bokeyan bûyî, û nav û dengê te ketibûn nav meqamên bilûrvanan, tîlên tenbûrvanan, stranên şivanan, û heta bi oldarên herêma me be, di kûraniya şevan de wêneya bejna te ya zirav di xewn û xeyalên xwe de bi bîr dihanîn. Dema gihîştim gundê bavê te agir ji asîmên dibariya. Careke din şerekî dijwar di navbera Ehremên û Hurmuzî de dest pê kiribû. Şirmaqên gîrr û xezeba Yezdanê zivistana brûsk ji nav ewrên reş dipijiqandin, gurme-gurma tavan bû, zîpik ji jor dibariyan. Mirina malwêran hema bi çend rojan berî hatina biharê dixwazt te jî bi xwe re bibe û bike bûka xwe, Rojînê. Şêxan, melleyan û feqîyan xwe li mala bavê te girtibûn, nivîşt li dû nivîştê dihat nivîsandin, qurban li dû qurbanê dihat serjêkirin, yasîn li dû yasînê dihat xwendin, û xortên êla we

bêdeng mabûn, evîndarên te stuxwar li ber Yezdên digeriyan ku bila wan li şûna te pêşkêşî deryaya mirinê bike. Rê nedan min da te derman bikim, bawer nebûn bi hêza min ya yezdanî û nehîştin ez pê li deriyê odeya te bikim. Heft roj û şevan bûm mêvanê mala bavê te û di şkestina şeva roja heştêmin de, min xwe bi dizî xuşand odeya te. Giyanê te di binê lihêfê de û di nav xuha sikranê de şil û pil bû bû, nalîneke zirav ji te dihat der û te di navbera jînê û mirinê de avjeniyêke bêliv dikir. Min tenê nav û dengê te bihîstibûn, Rojîn. Digotin tu ji pêriyan xweşiktirîn pêrî yî, ji kevokan bedewtirîn kevok î,, ji xezalan spehîtirîn xezal î; digotin tu berxa mala Qoço Begê yî, stêrka êla bavê xwe yî, girana li ber dilê dayê yî, serbilindiya xalanan î, hêviya her çardeh pismaman î û xemgîniya çar biran î. De min ê çawa rê bida vemirandina jiyana di giyanê te de, min ê çawa bihîştê ku canê te ji bedena te ya delal bihata veqetandin?! Di kûraniya şevê de diya te ya mest bûyî di nav pêlên xewê de wenda bû bû, fîndê şermok hêstir li kêleka te dibarandin û tu di hembêza bêdengiyê de ber bi dawîya çemê jiyanê diçûyî. Min lihêf ji ser te rakir, destek avêt bin serê te yê delal û bi destê din kirasê te ji te danî; min destmala xwe xist nav kûzê avê, av ji destmalê guvasht û xuha li ser giyanê te ziwa kir, û min bi lêvên xwe bedena te ya horîyî ji eniyê ta tiliyên her du lingan maç kir. Û min li pêş giyanê te nimêja evîndariyê kir, min gote Yezdanî: Ey Xudayê gerdûna bêyî sînor, Tu dê vê şevê bikî ya dawîn ji zivistana mirinê, Tu dê vê berbangê bikî yekemîn berbanga rojên bihara jînê, Tu dê Roja pîroz îroj ji rojhilatê aso têxî xewanê û Tu dê Ezraîlê Mewtê ji Rojînê bi dûr xîni. Û min lêvên xwe gîhandin lêvên hingivîn yên Rojînê û di germahiya wan de hest kir şopa mizgînê, û dema

wê çavên xwe bi tirs vekirin, min gotê: - Metirse ji min, ciwanê, metirse. Va ye min ji te re aniye nûçeya ferecê. Roj li hilatinê ye, bihar di destpêkê de ye, dawîya mirina tahl e. Min her du çavên keça xilmaş ramûsan û çûm der. Rojîna Qoço Begê roja din bgotina xewnekê kiribû, gotibû melekekî ew maç kiriye û mizgîna hatina biharê daye. Dizanim, xelk tenê bi melekên bawer e, ne bi çakmirovên jêhatî. Wisa jî baş e. Temenê min pênceh sal bûn, ez bavê sê ciwanan bûm û ligel ku di nav sîngê min de dilekî ciwan xwe radikişand jî, min dizanibû rêyên qedera min û Rojînê dê di wê dem û şûnê de nebûna yek: Û erf û toreyên me Kurdan û kurmamên di rê de û zarokên min û diya wan û hîna bi ser de her du êlên me ji heft bavan û vir ve jin nedabûn hev! Divabû ez li şûneke din, di nav demeke din de, û di jiyaneke nû de rastî Rojînê bihatama; û min gote Yezdanî: Ez ê vegeim vî erdê mirovan û nemirovan, ji bo xatirê Rojînê ez ê vegeim; û ez dizanim ew ê jî vegere. Û min dîsa, îcar bi rêya Roja Pîroz, gote Yezdanî: Qedera min di jiyana yekem de di dest Te de bû, lê di ya duyem de Tu dê min û Rojînê bigihîni hev û din. Min dizanibû ew roja dê bê, min dizanibû dê bê. Panzdeh rojan li dû destpêka biharê, min xatir xwazt ji yên xwe, ji xêzana xwe bexişandin tika kir. Û min nameyeke yekrêz bi rêya Şêx Ubeydullah M. ji Rojînê re şand:

“Da ku tu bijî ez ê xwe weke qurban pêşkêş bikim, lê bizanibe ku em ê hev û din bibînin, ey Pêriya li ber dil giran.”

Di meha nîsanê de, li ser girekî nêzikî Çemê Xabûrê, min xwe pêşkêşî brûskê kir, weke ku min ji bo xatirê Rojînê soz dabû Ehremanî. Lê min dizanibû em ê vegein.





## ولات «ثقافية - عامة - مستقلة»

العدد الثاني ٥ حزيران ٢٠١٣

welat.press@gmail.com

www.facebook.com/DengeKurdistanasurya